Di şert û mercen iro de tu rêxistin an partîyeke me ya li bakurê Kurdistanê ku bikaribe bi serê xwe hêjaiyekê bi dest bîne an bixe tune ye. Madem rewş ev e, çîma em hêz û qawetê xwe nekin yek? Rewş weha dixuye ku êdî siyasetmedar û rêvebirin partîyen bakurê Kurdistanê jî ev baş fêmkirine ku hêdî hêdî ji bona yekitiyan gavêñ erêñ diavêjin

Baş tê zanîn ku me weke miletê kurd heta roja iro ji ber neyekbûn û nerêziya nava xwe wenda kirî ye. Ev a bû sed salin ku ev rewş didome. Lê hê jî me weke miletê kurd, li gel partî û rêxistinê xwe fêm nekirine ku heta rewşa me ev be, em ê negihêjin tu armanc û qonaxa azadiya welatê xwe.

Gelek caran ji bona yekbûn an bi hevre karkirinê hin hewlîn cê jî bû bûn, lê tu yekrêzî û bi hevre karkirina partî û rêxistinê bakurê Kurdistanê pêk nehatibû, ne hatiye. Ev bûye sedem ku yekitiya nivîsakrêñ kurd, hunermend û dengbêjîn kurd jî pêk nehatiye. Ew jî weke partîyen siyasî ji hev belawelane û piranî jî ji hev hez nakin.

Ji hevbelavbûn û ne yekrêziya nava me dibû sedem ku em li hev nekin. Em qîmet û rûmeta hev negirin. Em nebûn û nabin pesindanê siyasetmedarên wêrek, nivîskarêñ zîrek û qîmetgirtina kesayetiyan nava xwe.

Min û gelek canik û camêrên din jî me pir gotiye û nivîsîne ku ci dema welatê me hate dabeşkirin, hêdî hêdî mejî û baweriyan me jî hatin perçekirin ku em tim sexesî bifikirin û tevbigerin. Tevgerên sexesî tu caran bi sernetine û nakeve. Ji ber ku qetandina zincîren koletiyê bi yekîtî hêza neteweyî pêk tê.

Ya herî girîng jî ji hevbelavbûn û neyekrêziya nava me ye ku em jî hîs û baweriya neteweyî dûr ketine. Ji ber ku herkes ji bona xwe kar dike da ku ew bi serkev e. Partîyen me yên siyasî jî di vê rewşê de ne.

Vê ji hevbelavbûnê jî em kirin kole û welatê me jî bû perçak nanê dagirkeran. Wan dixwarin û me jî li wan dînerî. Wan bi hebûna sererd û binerdîn me kîfa xwe dikirin, em jî weke kole ji bona nanûzikê di nava kar debûn.

Heta ku mirov nebe axayê mala



xwe. Rêvebirê welatê xwe. Mirov ê tim bibe xizmetkarê yên ku em û welatê me dagirkirine. Ji xwe roja welatê me perçê kirine û heta niha ev rewş her berdewam e.

Divê neyê ji bîr kirin ku ci dema bi serpereştiya nemir Îdrîs Barzanî li başûrê Kurdistanê eniya Kurdistanê hate damezrandin, kurdên wir hilmeke rehet girtin û bi serpereştiya wê welatê xwe azad kirin. Heta ku em jî li bakurê Kurdistanê nebin xwedî eniyeke neteweyî, wê her perçebûn û koletî jî bibe para me.

Di şert û mercen iro de tu rêxistin an partîyeke me ya li bakurê Kurdistanê ku bikaribe bi serê xwe hêjaiyekê bi dest bîne an bixe tune ye. Madem rewş ev e, çîma em hêz û qawetê xwe nekin yek?

Rewş weha dixuye ku êdî siyasetmedar û rêvebirin partîyen bakurê Kurdistanê jî ev baş fêmkirine ku hêdî hêdî ji bona yekitiyan gavêñ erêñ diavêjin

Bi van gav avêtînana jî weha dixuye ku êdî dor dora yekitiya partîyen Kurdistanê li bakurê Kurdistanê ye. Destpêka vê ji PAK û Tevgerê de destpê kir û bi navê PWK yekitiya xwe ragihandibûn. Niha HAK-PAR û Hereketa Azadî bi navê HAK-PARê weke yek partî wê kar bikin.

Niha jî dora hemî PDKyên li bakurê Kurdistanê ye ku ew jî bibin yek û bi navê PDK-Bakur karê xwe yên siyasî bidomîn. Ji ber ku hebûna navê PDK li bakurê Kurdistanê girîng û pîroz e. Piraniya rêvebir û serokên her perçekî pdk hevalbendîn min yên ku me demekê bi salan bi hevre kar kiribûn. Ji bona

yekitiya nava wan ci erk bikeve ser milêñ min ez amade me.

Piştî yekrêziya PDKyên jî dora damezrandina Eniyeke Kurdistanê ye ku ev ê bibe, pêşîlîgirtina ji hev belavbûnê ku wê gava temsîla Kurdistanê bê avêtîn. Edî wê dinya, dost û dijmin jî bizanibin ku temsîlkare bakurê Kurdistanê wê eniya Kurdistanê be.

Heger em dixwazin ji gelê xwe re xizmetê bikin, ji vê pêve tu rîyên çareserîyê yên din tune ye. Mînaka vê li ber çavêñ me ye. Heger eniya Kurdistanê li başûrê Kurdistanê pêk nehatiba dibû ku iro em ne xwedîyê xwe û vê hebûnê ango azadiya başûrê Kurdistanê bana.

Edî zêdebûna partîyan li bakurê Kurdistanê zeraî dide tevgera azadiyê û em hemî ji vê zeraî dibîn. Madem armanca me tevan azadiya bakurê Kurdistanê û piştigiriya perçê azad ango başûrê Kurdistanê ye. Divê em jî rojek berî rojekê hêzîn xwe bikin yek. Li ser asasê xeta neteweyî eniya Kurdistanê ragîhînin da ku kîfa dostan bînîn û tîrsa dagirkeran zêde bikin.

Bi vê munasebetê ez weke rewşenbîrekî gelê xwe, nivîskarekî hezkirin xwe, yekîtiya ku PWK û ya HAK-PARê ku pêk anîbûn, pîroz dikim. Li bendê me ku hemî PDK yê li bakurê Kurdistanê jî zûtîn demê yekîtiya xwe pêk bînîn. Van hersê partîyîn hêja (HAK-PAR, PWK û PDK-BAKUR) bi hevre eniya Kurdistanê ya bakurê Kurdistanê ragîhînin. Wê demê em ê bibin xizmetkarê gelê xwe û piştigire başûrê Kurdistanê.

Serok Mesûd Barzanî: Armanca Enfalê guherîna demografiya Kurdistanê bû

Herwiha Serok Mesûd Barzanî dever û gundên devera Badînanê diyar kir ku divê Îraq vê komkujiyê rastî êrişên nemirovane yên



qerebû bike û got, "Em bi tundî tekezî li ser mafêñ rewa yên gelê xwe dikin." Di ser qonaxa dawî ya Enfalê "Enfala Badînanê" re 36 sal derbas bûn.

Enfala Badînanê 25ê Tebâxa 1988an dest pê kir û 6ê Îlona heman salê bi dawî bû.

"Armanca Enfalê guherîna demografiya Kurdistanê bû"

Serok Mesûd Barzanî bi minasebeta 36emîn salvegera Enfala Badînanê peyamek belav kir û wiha got:

"36 sal berî niha ji 25ê Tebâxa 1988an heta 6ê Îlona 1988an bi dirêjahiya zincîre tawanênen rejîma Îraqê li dijî gelê Kurdistanê, gelek

kîmyayî, girtin, kuştin, koçberkirin û enfalkirina welatiyên bêguneji aliye hêzên rejîma wê demê ya Îraqê ve hatin.

Di encama van tawanênen nemirovane de, bi hezaran welatiyên Kurdistanê şehîd ketin, winda bûn, koçber bûn û bi sedan gund hatin wêrankirin.

Armanca tawanênen rejîma berê ya Îraqê şikandina îradeya gelê Kurdistanê a piştevaniya şoşê û berdewamkirina siyaseta guherîna demografiya Kurdistanê bû.

Bi helkefta salvegera Enfala Badînanê em silav li giyanê şehîdîn vê tawanê û hemû şehîdîn Kurdistanê dikan û bi tundî

tekezî li ser mafêñ rewa yên gelê xwe dikin.

Divê ev tawan neyên jibîkirin û pêwîst e dewleta Îraqê qerebûya komkuji, tawan û hemû zilm û zordariya ku li ser gelê me hatiye kirin bike."

Enfala Badînanê

Enfala Badînanê, pêla heştan û qonaxa dawî ya Enfalê ye.

Enfala Badînanê, 25ê Tebâxa 1988an dest pê kir û heta 6ê Îlona 1988an berdewam kir.

Rejîma Beasê, bi Enfala Badînanê re êrişî xelkê li herêmên Amêdî, Dihok, Zaxo, Şêxan, Akrê û Barzanê kir.

Li gorî belgeyên fermî yên Îraqê, li Badînanê 13 hezar û 553 kes hatin girtin ku ji wan 3 hezar û 373 jin û 6 hezar û 964 zarok bûn.

Ji bilî komkujiya sivîlan, nêzî 600 gund wêran bûne û nêzî 60 hezar welatî jî koçber bûne û bê mal man.

Gelek gund jî hatin kîmyabarankirin ku ji wan 40 gundên Xirîstiyanan û 81 gundên Kurdên Ezidî bûn.

Rejîma Beasê, li van herêman komkujiyeke mezin kir ku heta îro jî di dilê gelê Kurdistanê de birîneke kûr e. Parlamentoya Îraqê 14ê Nîsana 2008an Komkujiya Enfalê bi awayê fermî nas kir.

Sivîlênu ku di şer de zerer dîtiye li dijî Tirkiyeyê doz vekir

Hejmarek kesên ku li seyrangeha Perexê ya nahiye Derkariyê

Parêzerê dosyeyê Hişyar Ozal beşdarî bultan Rûdawê bû û li ser



ya Zaxoyê di bomberbarana Tirkiyeyê de ziyan dîtine li dijî Tirkiyeyê doz vekir.

Hejmarek kesên ku li seyrangeha Perexê ya nahiye Derkariyê ya Zaxoyê di bomberbarana Tirkiyeyê de ziyan dîtine li dijî Tirkiyeyê doz vekir.

Parêzerê dosyeyê Hişyar Ozal got, "Li gorî qanûnê, kesê ku qerebû dixwaze ne hewce ye ku tenê hevwelatiyê Tirkiyeyê be."

20ê Tîrmeha 2022yan artêşa Tirkiyeyê seyrangeha Perexê ya nahiye Derkariyê ya Zaxoyê bombebaran kir.

Di encama bombebaranê de ji xeynî zereran, 9 geştyarê Ereb ên Îraqê canê xwe ji dest dabû û 26 geştyar jî birîndar bûbûn.

mijarê bersiva pirsên Hawar Celaledînê da.

15 kesan doz vekiriye

Hişyar Ozalp da zanîn ku heta niha 15 kesan li dijî Tirkiyeyê doz vekiriye ku 4 ji wan xwedîyên xwaringeh, market û cihêن seyrangehê ne û 11 kes jî ji gun-dekî navçeya Darkariyê ne.

Herwiha Ozalp li ser dosye û qerebûkirina xelkê wiha got:

"Li Bakurê Kurdistanê heta 2004an zêdetirî 4 hezar gundan hatibûn valakirin.

Li Bakurê Kurdistanê ew kesên ku li dadgehêñ idarî normal doz vedikirin, paşê jî diçûn Dodgeha Mafêñ Miovan a Ewropayê (DMME) û li wê derê heqê xwe distandin.

Piştî demekê DMMEyê ji Tirkiyeyê re got ku 'gelek dosye û xelkê zerermend têne cem me, divê hûn bi xwe beriya ku here dadgehan bi şiklekî hele bikin.'

Li ser vê 2004an qanûnek derket. Ji bo tespîtkirina zererê ya rûbirûbûna terorê qanûnek derxistin.

Li gorî wê jî her parêzgeheke Bakurê Kurdistanê girêdayî parêz-gariyan lijne hatin avakirin, ofîsên taybet ji bo wan hatin avakirin.

"Ne hewce ye welatiyê Tirkiyeyê bin"

Xelkê serê lê da li wê derê çiqas hat tespîtkirin li gorî wê qerebûya wan bi wî şiklî hat dayîn.

Ya yekem, li gorî vî qanûnê, ne hewce ye ku ew kesên serî lê bidin hevwelatiyê Tirkiyeyê bin.

Ya duyem, pêwîst nake ew kes, ew zerer an jî ew bûyer di nav sînorêne Tirkiyeyê de bin.

Tenê şertek heye, li ser rûbirûbûna terorê ev zerer derketibin holê. Anglo ya PKK ev zerer çekiribe, ji ber liv û tevgera Tirk ev zerer derketibe yan jî xelkê ji ber şer gundên xwe valakirin.

Ev ji Başûrê Kurdistanê dozên nûne, dibe ku Tirkîye bi şiklekî red bike.


Piştî wê rîya Dodgeha Mafêñ Mirovan a Ewropayê heye.

Gava ku me doz bir ber destê Dodgeha Mafêñ Mirovan a Ewropayê, ew dadgeh dê ji sedî sed li gorî berjewendiya zerermendan bîryar bide."

25-31 Avqust, Tebâxa sal 2024

Mesrûr Barzanî pêşwaziya Balyozê Pakistanê dike

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêşwaziya Balyozê Pakistanê dike.



Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro (Sêsem, 27.08.2024) pêşwaziya Balyozê Pakistanê Mihemed Zîşan Ehmed kir.

Di wê hevdîtinê de, her du aliyan dîtin û nerînên xwe li ser dawî pêşhat û pêşveçûnên Îraqê û giringiya pêşxistina peywendiyê Herêma Kurdistanê û Pakistanê li hev guhertin.

Di pareke din a wê hevdîtinê de, danûstandin li ser rewşa revenda Pakistanî li Herêma Kurdistanê û derfetên vekirina Konsulxaneya Pakistanê li Herêma Kurdistanê li paşerojê hatin kirin.

Almanya alîkariyêni di warêñ lojîstîk, tenduristî û medyayî dike Pêşmerge

Serokerkanê Wezareta Pêşmerge û Fermandarê Hêzên Almanyayê li Herêma Kurdistanê pîrsa



alîkariyêni Almanyayê yên di warêñ lojîstîk, tendirustî û medyayî de ji Hêzên Pêşmerge re gotûbêj dikin. Wezareta Pêşmerge belav kir, Serokerkanê Wezareta Pêşmerge Ferîq Rukin Îsa Uzêr bi Fermandarê Hêzên Almanyayê li Herêma Kurdistanê Kolonel Lars Persikowski re civiya. Di civînê de pîrsên girêdayî Wezareta Pêşmerge û tîma leşkerî ya Almanya li Herêma Kurdistanê hatin gotûbêjkirin. Herwiha behsa çaksaziya Wezareta Pêşmerge, pêngavêñ pêvajoyê û alîkariyê Almanyayê yên di warêñ lojîstîk, tendirustî û medyayî yên ji hêzên Pêşmerge re hatin kirin. Serokerkanê Wezareta Pêşmerge û Fermandarê Hêzên Almanyayê tekezî li ser berdewamiya peywendiyêni di navbera Wezareta Pêşmerge û hêzên Hevpemaniya Navdewletî li Herêma Kurdistanê û Iraqê kirin. Serokerkanê Wezareta Pêşmerge amadehiya Wezaretê ji bo hevkarî û heVahengîya zêdetir li gel welatîn hevpemani bi taybetî Almanyayê ji bo zêdetir pêşxistina peywendiyâni hemû waran de nîşan da.

Iraq: Me drona Tirkiyeyê xist xwarê

Hêzên Ewlehiyê yên Kerkükê ragihand ku li Kerkükê dronek ketiye xwarê.



Berdevkê Polîsê Kerkükê ragihandibû ku ev dron ji alîyê sîstema parastina asmanî ya Îraqê ve hatiye xistin lê ew nîzanin bê ya kê ye. Sîstema parastina asmanî ya Îraqê ragihand ku ew dron a Tirkiyeyê ye. Hat ragihandin ku ew dron bêyî ku destûra wê hebe li asîmanên Kerkükê firiye û Îraqê jî ew daye erdê. Hat zanîn ku ew drona Tirkiyeyê bi 4 guleyên balafîşkîn.

Mesrûr Barzanî li demeke nêzîk diyariyekê pêşkêşî zirardîtiyên Sûka Qeyseriya Hewlêrê dike

Parêzgerê Hewlêrê ragehand, "Şewata Sûka Qeyseriya Hewlêrê pênc milyar û 300 milyon dînarar tê nûjenkirin, ji bo ku li paşerojeke



dilê hemî Hewlêriyan êşand, Serokwezîr Mesrûr Barzanî piştrastî daye kedkarên wê sükê ku cihê wan bi zûtirîn dem jê re tê nûjenkirin."

Parêzgerê Hewlêrê Umêd Xoşnaw taybet ji ajansa K24ê re got, "Niha Sûka Qeyseriya Hewlêrê bi

nêzîk kedkar bikarin vejerin ser karê xwe."

Umêd Xoşnaw herwesa ragehand, "Şewata Sûka Qeyseriya Hewlêrê dilê hemî Hewlêriyan êşand, Serokwezîr Mesrûr Barzanî piştrastî daye kedkarên wê sükê ku karê nûjenkirinê bi

zûtirîn dem tê temamkirin."

Navbirî amaje jî da, "Serokwezîr Mesrûr Barzanî li van nêzîkan diyariyekê pêşkêşî zirardîtiyên Sûka Qeyseriya Hewlêrê dike."

Li şeva 05.05.2024ê agir berbû pareke Sûka Qeyseriya Hewlêrê û pişti çend seetan ji aliyê tîmê Bergiriya Şaristanî ya Hewlêrê ve hat kontirolkirin.

Parêzgerê Hewlêrê pişti wê rûdanê di ragehandinekê de eşkere kir ku, li dû dawî amar ji zêdetirî çar hezar dikanan, 227 dikan û heft embarên biçûk ên wê sükê şewitîn û zirar gehîst wan.

Gojimê terxankirî ji bo nûjenkirina Sûka Qeyseriya Hewlêrê pênc milyar û 300 milyon dînar in. Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo alîkarîkirina kedkaran ew bi pereyê gilêşî, tabloyan û baca 50% ya sala 2023ê û 100% ya sala 2024ê efû kirine.

Eniya Tirkmenî besdarî Hikûmeta Xwecihî ya Kerkûkê nabe

Ji ber stemlêkirina wan di Hikûmeta Xwecihî ya Kerkûkê de, Eniya Tirkmenî rûniştinên parêzgeha Nînowa jî boykot kirin û li ser wê yekê rijd in ku lihevkirina hotela Reşîdê ya Bexdayê ji bo pêkanîna Hikûmeta Xwecihî ya Kerkûkê neqanûnî ye.

Tirkmen roj bi roj li ser helwesten xwe li hember Hikûmeta Xwecihî ya Kerkûkê rijdtir dîbin û red dîkin ku bi ci awayan tevlî wê hikûmeta xwecihî bibin, ya ku li 10ê Tebaxê li hotela Reşîdê hatîye pêkanîn, heta ji ber wê stema ku di pêkanîna Hikûmeta Xwecihî ya Kerkûkê de li wan bûyî Civata Parêzgeha Nînowa jî boykot kir.

Wesa diyar e ku Tirkmen li beranberî bêparkirina ji Hikûmeta Xwecihî ya Kerkûkê destan danahêlin, nûtirîn pêngava wan civîna kesatiyê diyar ê Tirkmenên Îraqê, Hesen Toran, Serokê Eniya Tirkmenî û Erşed Salihî bi Cîgirê Wezîrê Derve yê Tirkîyeyê Noh Yilmaz re bû, ku li dû ragehandina wê civînê, danûstandin li ser rewşa Kerkûkê kirine.

Ji aliyeke din ve Qehtan Men-dawî yê Serkirde di Eniya Tirkmenî de careke din rijdbûna Eniya xwe li ser boykotkirina rûniştinên Civata



Parêzgeha Kerkûkê tekez kir û got, "Ya ku li roja 10ê Tebaxê qewimî neqanûnî bû, em tevlî hikûmeteke xwecihî nabin ku bi awayekî neqanûnî hatibe pêkanîn." Amaje jî da, "Em li benda biryara Dadgeha Federalî ne."

Herwesa çend çavkaniyan ew yek jî eşkere kir ku, Eniya Tirkmenî ji ber wê stema ku li Kerkûkê li wan bûyî rûniştinên Civata Parêzgeha Nînowa jî boykot kirine, xasma ku li vê dawiyê Eniya Tirkmenî tevlî du civînên Civata Parêzgeha Nînowa nebû, lewma jî wê civatê rîjeya qanûnî jî bo rûniştinê temam nekir.

Helwesten yek li dû yekê yên tund ên Eniya Tirkmenî li beranberî

pêkanîna Hikûmeta Xwecihî ya Kerkûkê û boykotkirina wê piroseyê di demekê de ne ku, zêdetirî carekê Parêzgerê Kerkûkê yê nû Rêbwar Teha daxwaz ji Eniya Tirkmenî kiriye ku biçe pal wan û postên xwe li Civata Parêzgeha Kerkûkê werbigire. Şeva Şemî, 10.08.2024, bê tevlîbûna PDK, Eniya Tirkmenî û hejmareke endamên Ereb ên Civata Parêzgeha Kerkûkê li Bexdayê, Parêzgerê Kerkûkê û Serokê Civata Parêzgeha Kerkûkê hatin hilbijartin. Rêbwar Teha wekî Parêzgerê Kerkûkê û Mihemed Hafiz jî wekî Serokê Civata Parêzgeha Kerkûkê hatin hilbijartin.



Cenazeyê şêhîd Tekîn Goyî ji aliyê hezaran kesî ve hat veşartin

Li Dêrikê bi hezaran kes cenazeyê fermandar Tekîn Goyî yê di êrîşa dewleta Tirk de şêhîd bû, veşartin.

Li Dêrikê ya kantonâ Cizîrê bi hezaran kes cenazeyê fermandar Tekîn Goyî (İsmet Unver) veşartin. Cenazeyê şêhîd ji gel ve ji pêş Nexweşaneya Şêhîd Hogir a Dêrikê hat wergirtin û bi merasîmekî li Goristana Şêhîd Xebat hat veşartin.

Di merasîmê de hevserokê

Meclisa Malbatên Şêhîdan a Kantona Cizîrê Mahsûm Hesen li hember êrîşen dewleta Tirk a dagirker banga xurtkîrina têkoşînê kir û got wê li ser reça şêhîd Tekîn bimeşin.

Endama rîveber a Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Rûken Ehmed bal kişand ser hezkirina şêhîd Tekîn Goyî ji welat û gelê xwe re û girêdana wî ya xurt bi felsefeya Réber Abdullah Ocalan û fedakariya şêhîdan

re û wiha got: "Şêhîd Tekîn civak û gelekî azad a li ser jiyanâ hevbeş û ewleh dixwest."

Hevserokê Desteya Ten-duristîyê Dr.Memo Xelîl got ku ew ê heta serkeftinê bibin şop-darê Şêhîd Tekîn Goyî.

Di dawiyê de wesîqeya şehadetê hat xwendin û radestî malbatê hat kirin. Cenazeyê şêhîd Tekîn Goyî bi dirûşmeyen "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey şêhîd" û "Şêhîd namirin" hat veşartin.

Fermandar Tekîn Goyî ku li Ofîsa Tenduristîyê ya Qamişlo

dixebitî, 19'ê Tebaxê di êrîşa dewleta Tirk a dagirker de şêhîd bû.

25-31 Avqust, Tebax sal 2024

Berdevkê PDKê: Partiya me bi hemû hêz, şîyan û cemaweriya xwe piştgiriya Mesrûr Barzanî dike

Berdevkê Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) Mehmûd Mihemed di daxuyaniyekê de dibêje,



"Demeke beşek ji rîveber û çapemeniyên YNKê dûr ji prensip û etîketên siyâsî, û heta dûr ji rewangeha rewşa navxwe ya YNKê bi xwe jî, li PDKê dinerin, û dijî birêz Mesrûr Barzanî Cîgirê Serokê PDKê û Serokwezîrê Herêma Kurdistanê, helwesten dijminatî, nefreta jidil, derew û nûçeyên bêbingeh belav dîkin.

Tekesta daxuyaniya berdevkê PDKê wiha ye:

Demeke beşek ji rîveber û çapemeniyên YNKê dûr ji prensip û etîketên siyâsî, û heta dûr ji rewangeha rewşa navxwe ya YNKê bi xwe jî, li PDKê dinerin, û dijî birêz Mesrûr Barzanî Cîgirê Serokê PDKê û Serokwezîrê Herêma Kurdistanê, helwesten dijminatî, nefreta jidil, derew û nûçeyên bêbingeh belav dîkin. Derwa wan a herî dawî jî, roja 26/8/2024 bû ku li ser malpera fermî ya YNKê daxuyaniyek hatîye belavkirin, bi navê (çavkaniyek ji YNKê).

Em wek Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) ji raya giştî û gelê Kurdistanê re tekez dîkin ku nîvîskar û kesên li pişt wê daxuyaniya YNKê, dixwazin li gorî rewşa navxwe ya YNK ya pir bal û şax, rewşa PDKê nîşan bidin. Partiya me xwedîyê rîbazeke rast û dirust e, û xwedî rîber û lêvegerek e ku serok Mesûd Barzanî ye û em hemû şopdar û têkoşerên rîbaza Barzanî ne û di bin sîwana Serok Barzanî de ji bo yek armanc û yek rîbazê tekoşînê dîkin.

Xebat, helwest, nerîn û siyaseta birêz Mesrûr Barzanî di hukimdarî û karê siyâsî de di çarçoveya bernâme û helwesta Partiya Demokrata Kurdistanê de ye, û li cem PDK, her êrîşek li ser kesayetiya Mesrûr Barzanî, êrîş e li dijî hemû endamên PDKê. Wan hêşta PDK nasnekiriye û ji dîrokê ders wernagrin, gelekan berê xewna wê yekê didîtin ku PDK jî weke xwe bikin, lê her wekî berê ku ew xewn û xeyala wan bicîh nehat, em wan piştrast dîkin ku PDK û endamên PDKê dêbihêz û bixwebawerî bin û dê xewn û xeyalîn wan careke din bixin bin heriyê.

Partiya me bi hemû hêz, şîyan û cemaweriya xwe piştgiriya heval Mesrûr Barzanî dike ku li ser hemû erkîn xwe berdewam be.

Mehmûd Mihemed Berdevkê PDKê 27.08.2024"

Mesrûr Barzanî: Pêwîst e hikûmeta federal malbatên şehîdan û Enfalkiriyan qerebû bike



Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ûro 25ê Tebaxê bi boneya 36 saliya qurbaniyêni Enfala Badînanê peyamek belav kir û tê de ragiahdm, "Divê hikûmeta federal erkêne xwe yên yasayî û exlaqî pêk bîne û malbatên şehîdan û qurbaniyêni Enfala gerekî bike.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî di peyama xwe de got: "Îro em qurbaniyêni Enfala li Badînanê bibîr tînin, ku beriya 36 salan di dawî qonaya enfala hovane ya rîjîma Beis de, bi hezaran xelkê bêguneh li devera Badînanê şehîd û winda kirin. Bi sedan gundêne neverê wêran kirin ku bp sedema koçberbûa

bi dehhezaran kes.

Amaje bi wê jî kir, "Armanca van tawanêni hovane, qirkirin û jenosîdkirina gelê Kurdistanê bû, lê berpirsyarêni komkujiyan nekarîn îrade û daxwaza azadiyê ya gelê Kurdistanê têk bibin." Serokwezîr Mesrûr Barzanî gor: "Di vê boneyê de em tekez dîkin ku divê hikûmeta federal erkêne xwe yê yasayî û exlaqî cîbicî bike û malbatên şehîdan û qurbaniyêni Enfala destê rejîma berê ya Iraqê, gerekî bike." Serokwezîr Mesrûr Barzanî di dawiya peyama xwe de silav li giyanê pak ê qurbaniyêni Enfala Badînanê û hemû şehîdîn Kurdistanê kir û ragihand, "Hikûmeta Herêma Kurdistanê li ser hewlêne xwe berdewam dibe û her ci di karînên wê de be, dê ji bo xizmeta malbatên şehîdan û enfalkiriyan bike."

Şaxewan Ebdullah: Ji sedî 70ê posten parêzgeha Kerkükê ji destê kurdan hatine standin

Cîgirê Serokê Parlamentoira Iraqê ragihand, mafêti aliyeke nîne bi tenê li Kerkükê postan dabeş bike û



got: "Pêwîst e rîkeftina YNKê ligel aliye Kerkükê bi yasa were sererastkirin." Cîgirê Serokê Parlamentoira Iraqê Şaxewan Ebdullah di kongreyeke rojnamevanî de ragihand: "Kurd ji sedî 70ê posten parêzgeha Kerkükê jidest dane û tenê postê fermanدارiya polîs di destê Kurdish de maye."

Ebdullah jî got, mafêti aliyeke nîne ku bi tenê li Kerkükê postan dabeş bike û got: "Pêwîst e rîkeftina YNKê ligel aliye Kerkükê bi yasa were sererastkirin." Roja 10ê Tebaxê bê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK), Bereya Tirkmenî û hejmarek ji endamên ereb ên Encûmena Parêzgeha Kerkükê, Bexdayê Rêbwar Taha wek Parêzgar û Mihemed Hafiz jî wek Serokê Encûmena Parêzgehê hilbijartin.

Beriya civînê, Frakşyonê PDKê, Bereya Tirkmenî û Hevpeymânia Erebî li Encûmena Parêzgeha Kerkükê di 3 daxuyaniyê cuda de beşdarbûna di civînê de red kiribûn û ew civîn bi "ne yasayî" binav kiribûn û tekez kiribûn ku ew di dema xwe de nehatine agahdarkirin.

Makbule Ozer: Gelek keç û jinêni ciwan di girtîgehê de ne

Makbule Ozera 82 salî ku ûro ji girtîgehê derketibû ji Rûdawê re axivî û ragihand ku dema ew di



girtîgehê de bû her roj diçû nexweşxaneyê.

Kurê Makbule Ozerê Serhat Ozer li ser hesabê xwe yê medyaya civakî wêneyê dayîka belav kir û ragihand: "Dayîka min a ezîz Makbule Ozer vê sibehê bi awayekî lez û bez hat berdan." Makbule Ozer 9ê Gulana 2022yan bi hinceta ku "alîkarî daye PKKyê" li navçeya Artemêtê ya Wanê hatibû girtin. Ozer ji ber ku gelek nexweşiyê wê hene 7ê ilonê hatibû berdan.

Piştî ku Saziya Tiba Edlî got, "dikare di girtîgehê de bimîne" dubare hatibû girtin û li Girtîgehê Wanê hatibû bicihkirin. Cezayê girtîgehê yê Makbule Ozerê ûro bi dawî bû û bi awayekî biley ji girtîgehê hat derxistin. Makbule Ozer bû mîvana Bultena Bakur a Rûdawê ku Hêvîdar Zana pêşkêş dike.

"Gelek keç û jinêni ciwan di girtîgehê de ne"

Makbule Ozerê li ser derxistina xwe ya ji girtîgehê wiha got: "Serê şeveqê ji min re gotin 'xwe amade bike tu dê herî mala xwe'. Hevalan eşayê min hazır kirin ez birim qereqolê û ji wir jî ez anîm malê. Nehîştin ti kes were pêşîya min. Kêfa min hat, gelekî kêfa min hat ez li malê me nava zarok û neviyêni xwe me. Gelek keçen ciwan û jî di girtîgehê de hene. Jineke bi temen a bi navê Henîfe jî di girtîgehê de ye û wê jî nidîkarî karûbarêni xwe bike.

Destekî wê seqet bû hîn 6 meh ji derketina wê re maye. Heta rojekê mabe jî ti kesî ji girtîgehê bernadin. Heta ku rojêni min jî xilas nebûn min jî bernedan. Her roj min dibirin nexweşxaneyê û dianîn. Niha rewşa min baş e û niha li nava zarokêni xwe me. Ez dê baştir jî bibim."

Di konferansa Berlînê de sûcên şer ên dewletan hate nîqaşkirin

Di Konferansa Aşitî û piraniya şehadetan jî bi encama êrîşa dewleta Tirk û çeteyên wî



lidarxistin de mijara 'Sûcên Şer ên Dewletan' hate nîqaşkirin û hate destnîşankirin ku ev pêvajo dibe bi têkoşîna gelan bi dawî bibe. Rûniştina 4'emîn a Konferansa Aşitî û Demokrasiyê ku li Berlîn a paytextê Elmanyayê tê lidarxistin, bi panela sernavê 'Sûcên Şer ên Dewletan' dewam kir. Moderatoriya panelê Dr. Nazan Ustundag kir û Nûnerê PYD'ê yên Ewropayê Fuad Omar, Wêjevan Asli Erdogan, Parlementerî berê yê HDP'ê Garo Paylon û Derhênerê Giştî yê Draw Medîa Mohammed Raoof Abdulazzez besdar bûn.

Mohammed Raoof Abdulazzez ê bi rîya Skype besdar panelê bû, têkildarî êrîşen dagirkirîyê yên dewleta Tirk ên li ser Başûr û baregehêne leşkerî yên li wir agahî dan.

Abdulazzez diyar kir ku bombebaran û komkujiyêni dewleta Tirk ên li Başûr mijara dadgehêne cezayê yên navneteweyî ne û anî ziman ku di êrîşen dewleta Tirk de bi sedan kes birîndar bûne û komkujiyeke mezin a xwezayê hatiye kirin.

Nûnerê PYD'ê yên Ewropayê Fuad Omer bi bîr xist ku di şerê li Rojava tê berdewam kirin de bi hezaran kes şehîd bûne û

çêbûne. Omar diyar kir li gorî qeydîn saziyên navneteweyî yên sala 2018'an di dema dagirkirina Efrînê de li Sûriyeyê bûn, 900 sivîl hatine qetilkirin û di nava wan de jin û zarok jî hene. Omar anî ziman ku 9 hezar û 756 kes jî birîndar bûne û 139 qeydîn destavétinê jî ji aliyê van saziyan ve hatiye tespîtkirin, lê gelek jin ji ber zexta civakî veşartine.

Omar ragihand ku li Efrînê zêdeyî 400 hezar kes ji cihê xwe hatine kirin, li şûna wan kesên ji herêmên din hatine bicihkîrin, zêdetirî 400 hezar da, 52 cihên dîrokî û 15 cihên baweriyê bêkêr bûne. Her wiha anî ziman ku li herêmên Serêkaniyê û Girê Spiyê zêdeyî 10 hezar kes bi zorê ji cihê xwe hatine kirin û bi hezaran kesên ne xwecîhî li şûna wan hatine bicihkîrin.

Omar diyar kir ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Rojava weke rîber tê qebûlkirin û li ser felsefeya wî avabûn çedîbin û got dewleta Tirk bi komkujiyan bêtehemûliya xwe ya li hemberî vê rewşê nîşan da. Omer destnîşan kir ku hewlânê dewleta Tirk ên ji bo pêşxistina têkiliyêni bi dewleta Sûriyeyê re, bi armanca têkbirina


gotinên weke 'em poşman in' û 'em bi fikar in' bes tê dîtin. Paylon destnîşan kir ku ev pêvajo bi têkoşîna gelan dikare bi dawî bibe. Konferans wê sibe jî bi komxebat, panel û nîqaşan dewam bike.

Beşdarêni ku rûniştinê roja ewil di saetên êvarê de bi dawî kirin, bangên xwe yên aştiyê li qada Hermannplatzê bi daxuyaniya çapemeniyê ragihandin.

Daxuyanî ji aliyê Wezîrê Edaletê û berê yê Îzlandayê Ogmundur Jonasson û Prof. Dr. Neşe Ozgen û Siyasetmedarê Kurd Hatîp Dîcle ve hat kirin.

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji dîrokî heta roja iroyîn ji bo pêkanîna aştiyâ civakî hewldaneke pir jidil kiriye

Serokwezîr Mesrûr Barzanî: Ji ûro ve bazareke nû li ber cotoyarêne me tê vekirin



Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê piştî ûmzakirina yadaştnameyeke hevfîmkirinê bi Wezareta Çandinê ya Urdinê re ragehand, "Ji ûro ve bazareke nû li ber cotoyarêne me tê vekirin."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî ûro li ser hisaba xwe ya tora civakî ya Xê parve kir, "Ez dîlxwêş bûm ku me ûro yadaştnameyeke

hevfîmkirinê bi Wezareta Çandinê ya Urdinê re ûmza kir, ji ûro ve bazareke nû li ber cotoyarêne me tê vekirin."

Bi çavdêrî û serperiştiya Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, ûro (Yekşem, 25.08.2024) di warê pêşxistina alîkarî û hevahengiya çandinê û pîşesaziya xwerakî de, yadaşteke

hevfîmkirinê di navbera Wezareta Çandinê ya Herêma Kurdistanê û Wezareta Çandinê ya Şanîşnâ Urdinê de hat ûmzakirin, ku biryar e di pêngava yekê de Urdin hin ji berhemên Herêma Kurdistanê hawerde bike, wekî petatan.

Herwesa Wezîra Çandinê û Çavkaniyê Avê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Bêgerd Talebanî jî ragehand, "Ew yadaştname ji 10 madeyên cuda cuda pêk hatiye lê 13 bendê cewherî vedi-gire, ku çawaniya serederîkirina li ser kertê çandinê bi her du pişkîn şînkatî û perinde û berhemên can-dar û kargehan ve, ku di kertê pîşesaziya xwerakî de li Herêma Kurdistanê kar dîkin. Lewma dibe ezmûneke nû ji tevaya wan ezmûnan ên ku Herêma Kurdistanê di demê borî de tê re derbaz bûye, xasma jî di dema pênc salê karkirinê yê Kabîneya Nehê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê de.

25-31 Avqust, Tebax sal 2024

Perlemanterekî Kurd dibe Cîgirê Serokê Komara İslâmî ya Îranê

Hisênzade yekemîn Kurd e di dîrka Komara İslâmî ya Îranê de dibe Cîgirê Serokkomarî.



Serokkomarê Îranê yê nû Mesûd Pizîşkiyan ferma destpêkirina karî ji bo perlemanterê Kurd Ebdilkerîm Hisênzade wekî Cîgirê Serokkomarî derxist, ku dê ji doza pêşxistina gundan û devêrên dûr berpirsyar be. Hisênzade, ku endamê Lijneya Avedankirinê û Nûnerê Şeniyênen Bajarê Naxede û Şinoyê yê Rojhîlatê Kurdistanê li Perlemana Îranê ye, dibe yekane perlemanterê Kurd û Sune di kabîneya 14ê ya Hikûmta İslâmî ya Îranê de ku, piştî şoreşa İslâmî ya Îranê vî postê bilind yê Komara İslâmî ya Îranê werdigire. Pizîşkiyan di ferma xwe ya komarî de nivîsiye, "Ezmûna bişîyan û sozên Ebdilkerîm Hisênzade sedem bûn ku ji bo vî postî bê ras-partin û biryara destpêkirina karî jê re bê derxistin." Biryara Pizîşkiyan duhî (Duşem, 26.08.2024) derketiye û tê de hatiye, "Bi mere-ma baştîkirina jîn û jiyara gundiyan û pêşxistina gundan û tekezkirina li ser rolê gundiyan ji bo bidestxistina aborekî bihêz û mukom, biryara Cîgirê Serokkomarî hatiye derxistin ji bo ku çavdêrî û serperiştiya karan û hevahengiya bi dezgehêne peywendîdar re bike." Ebdilkerîm Hisênzade li sala 1980ê li bajarê Naxedeyê yê Parêzgeha Urmiyê ya Rojhîlatê Kurdistanê hatiye ser dînyayê, û kesatiyekî siyasî yê Kurd e ji desteya çaksazîxwazên Îranê.

Ezîz Şerkanî: Zarokên Ezidî yê winda war û kesûkarêne xwe nas nakin

Îro roja cîhanî ya kesên winda ye. Şêwirmendê Tora Hevpeymaniya Kêmaniyênen Îraqê amajeyê dide, "Ew zarokên Ezidî yê ku



li ser destê DAIŞê hatine windakirin û hêsta zindî ne, ji ber ku wê demê hêsta biçûk bûn, niha nasname û war û kesûkarêne xwe nas nakin."

Şêwirmendê Tora Hevpeymaniya Kêmaniyênen Îraqê Ezîz Şerkanî îro (in, 30.08.2024) taybet ji K24ê re got, "Rewşa kêmaniyen li Herêma Kurdistanê li beranberî Îraq û Rojhîlata Navîn geleb baştîr û pêşkeftîtir e."

Ezîz Şerkanî amaje jî da, "Komkujiya Ezidiyan li sala 2014ê ji aliyê DAIŞê ve li ser astê cîhanî mezintirin komkujiya sedsala bîst û yekê ye." Navbirî ron jî kir, "Heta niha zêde-tîrî du hezar û 500 Ezidiyan winda ne, hejmareke wan hatiye jenosîdkirin û hejmarek li kempa Holê ye û heta niha nehatiye azadkirin û herwesa hene jî ku ji bo welatêne din û xasma welatêne Erebî hatine veguhastin."

Şêwirmendê Tora Hevpeymaniya Kêmaniyênen Îraqê herwesa got, "Ên ku hêsta zindî ne û winda ne dibin du hezar kes û piraniya wan jî jin û zarok in."

Li Amedê çêkirina 6 hezar avahiyêne erdhejê temam bû



Li parêzgeha Amedê ya Bakurê Kurdistanê 6 hezar avahiyêne erdhejê temam bû û avahî radestî xwedîyên wan hat kirin.

Wezîre Hawirdor, Bajarvanî û Guherîna Av û Hewayê yê Tirkîyeyê Murat Kurum ragihand, piştî erdhejê navenda wê Meraş, li Amed dest bi çêkirina 10 hezar avahiyêne erdhejê kirin.

Murat Kurum diyar kir çêkirina 6 hezar avahiyen qedîya.

Herwiha di daxuyaniya Wezareta Hawirdor, Bajarvanî û Guherîna Av û Hewayê de hat diyarkirin çêkirina avahiyêne erdhejê didome û yên temam bûne jî teslimî xwedîyên wan dikin.

Serokatiya İdareya Avahiyêne Komî (TOKİ) li Amedê projeya 20 hezar û 286 avahiyen ku ji 14 beşan pêk tê daye destpêkirin.

6 hezar qedîyane û 3 hezar û 839 xwedîheq derbasî malêne xwe yên nû bûne.

Amerîka destxweşiyê li Hikûmeta Herêma Kurdistanê dike

Konsulê Giştî yê Amerîkayê li Herêma Kurdistanê û Fermandeyê nû yê Hêzên Serbazî yên



Hevpar di Operasyonên Çareseriya Bingehîn de di peyamekê de destxweşiyê li Hikûmeta Herêma Kurdistanê dikan, ji ber çaksaziyên wê li Wezareta Pêşmerge. Konsulê Giştî yê Amerîkayê li Herêma Kurdistanê û Fermandeyê nû yê Hêzên Serbazî yên Hevpar di Operasyonên Çareseriya Bingehîn de di peyamekê de destxweşiyê li Hikûmeta Herêma Kurdistanê dikan, ji ber çaksaziyên wê li Wezareta Pêşmerge. Konsulxaneya Giştî ya Amerîkayê li Herêma Kurdistanê duh (Duşem, 26.08.2024) li pêgeha xwe ya fermî ragehand, "Konsulê Giştî yê Amerîkayê li Herêma Kurdistanê Stephe Bitner û Fermandeyê nû yê Hêzên Serbazî yên Hevpar di Operasyonên Çareseriya Bingehîn de Lîwa Lîhî bi Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî, Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, Cîgirê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Qubad Talebanî û Serkîretiya Pêşmerge re civiya." Konsulxaneya Giştî ya Amerîkayê herwesa got, "Di wan civînan de her du aliyan behsa rûdanê neverê kir û pabendbûna xwe ya hevpar ji bo parastina ewlehî û seqamgiriya Îraqê bi rîya alîkariya hevpar a ewlehiyê û bizavêñ çaksaziyê yên hêzên Pêşmergeyan tekez kir." Çavkaniya navbirî amaje jî da, "Konsulê Giştî yê Amerîkayê û Fermandeyê Hêzên Serbazî yên Hevpar destxweşî li Hikûmeta Herêma Kurdistanê kir, ji ber wan pêşkeftinê ku heta niha di piroseyâ çaksaziyê ya Hêzên Pêşmergeyan de bi dest ve hatine."

CENTCOM: Me li Îraqê 15 DAIŞî kuştin

CENTCOMê ragihand ku wan bi hêzên Îraqê re li rojavayê Îraqê 15 endamên DAIŞî kuştine.

Fermandariya Navendî ya Amerîkayê (CENTCOM) bi daxuyaniyekê ragihand ku wan bi hêzên



Îraqî re operasyoneke hevbeş encam daye ku li dijî serkirdeyê DAIŞî bûye. Fermandariya Navendî ya Amerîkayê (CENTCOM) got: "Di operasyonê de 15 endamên DAIŞî hatin kuştin û ti sivil nebûn qurbanî."

Berpirsekî leşkerî yê Amerîkî ji AFPyê re daye zanîn: "Di operasyonê de 7 serbaz birîndar bûn û rewşa hemûyan baş e."

CENTCOMê destnîşan kir ku operasyon li rojavayê Îraqê hatiye kirin lê cih diyar nekir.

CENTCOMê her wiha da zanîn: "Endamên DAIŞî bombevêdestan û bombevêçen çandî bi kar anîn û piştînên bombebarkirî jî li xwe pêçabûn."

Operasyona hevbeş di demekê de ye ku Îraq û Amerîkî gotûbêjîn derbarê paşeroja hêzên Amerîkî û hevpemaniyê li Îraqê berdewam dikan.

Amerîkayê di çarçoveya Hevpemaniya Navneteweyî ya li dijî DAIŞî de 2 hezar û 500 leşker li Îraqê û 900 leşker jî li Sûriyeyê bi cih kirine.

Hewlîr di 28 salêñ borî de bûye navendeke siyasî, dîplomasî û aborî

Rêveberiya bajarê Hewlîrê di heyama 28 salêñ borî de, bi awayekî zanistî û sîdwergirtina ji ezmûna welatêñ din, bû sedem ku ev bajar bûye mînaka navendeke pêbawer li cîhanê di warêñ cuda de.

Pêşkeftina Hewlîrê di 28 salêñ derbasbûyî de di hemû waran de, bala welatêñ cîhanê kişandiye ser xwe û ev bajar di warê ïdarî, xizmetguzarî û siyasî de, bûye hevrikî gelek bajarêñ navdar ên cîhanê.

Hewlîr di warê dîplomasiyê de, xwe li kîleka paytextên herî navdar ên Rojhilata Navîn xwe nîşan dide û li ber çavêñ hêzên cîhanê bûye cihekî stratejîk. Di warê bazirganiyê de, bûye navendeke bihêz a aborî û xaçerêya welatêñ pîşesazî û kompaniyêñ cîhanê yên ku di warêñ curbicur de veberhênanê dikan. Ligel wê jî, ew di şert û mercen zehmet de jî, bajar bûye penageha bi milyonan koçberan.

Handereke din a pêşketina Hewlîrê, vedigere 28 salêñ derbasbûyî, ku ji bo parastina Hewlîrê ji her destêwerdana derveyî, armancêñ gumanbar û ajandaya siyasî û daxwazêñ dijberên Kurd, karî pendêñ mezin ji rewşen cuda û bûyerên berê werbigire. Ji bo vê yekê jî, di van salan de, xwe spard baştîrîn pilan û nexşeyen stratejîk ên cîhanê û roj bi roj Hewlîrê di hemû waran de gavêñ berferehtir avêtin.

Di warê ïdarî de, Hewlîr di van 28 salan de bûye nimûneyeke balkêş a Iraq û herêmê bi giştî, di vê heyamê de çendêñ gund kirin nahiye, nahiye jî kirin qeza û qaza jî kirin ïdareyên serbixwe.



Hewlîr di warê siyasî de hertim cihê kombûna hêzên Iraqî bûye û roleke berçav di çareserkirina gelek pirsgirêkên welat de dîtiye, bi taybetî destpêşxeriyên Serok Barzanî di dema damezrandina hikûmetên li dû hev yêñ Iraqê de.

Di warê dîplomasiyê de, Hewlîr ji bo gelek welatêñ cîhanê bûye qonax-ekê girîng li herêmê û piştevanî û dostaniya bihêz a hejmareke berçav ji paytextên navdar ên cîhanê bidest xistiye. Welat wê wekî paytexta welitekî serbixwe, ne wekî herêmek federal dibînîn. Vê yekê ew kiriye navendek pêbawer û bala veberhênerên herî navdar ên cîhanê kişandiye ser xwe.

Li ser asta xizmetguzariyê, bi berçavgirtina zêdebûna nifûsê û fêrbûna ji pêşketinê cîhanê, tevî hewlîn berdewam ji bo rawestandina vê pêşkeftina mezin bi rîya dorpeçkîrina aborî û birîna mûçe û bûdceya xelkê, lê proseya avedankirina li

Hewlîrê berdewam bû û bi dehan projeyên cuda yên weke rê, avedankirina bajarêñ nû, dibistan, nexweşxane, av û kanalîzasyon, bendav, cihêñ geştyarî û pîşesazî hatin cîbicîkirin.

Di warê bazirganî û aborî de, Hewlîr karîbû ji bikarhêner veguhere hilberîner û hejmareke berçav ji berhemên wê gîhîştina deverên herî dûr ên cîhanê.

Hewlîr bûye navendeke pêbawer a perweerde û xwendina bilind. Li ser asta tendirustiyê jî, nexweşxaneyên Hewlîrê hertim ji bo gelek nexweşen parêzgehêñ din ên Iraqê, bûne rizgarker.

Ji aliye ewlehiyê ve jî, bi sedema aramiya vî bajarî û baweriya bi pêkvejiyana pêkhateyên cuda, Hewlîr bûye nimûneyeke berçav li Iraq û navçeyê bi giştî. Ev hemû pêşketin bi saya rîveberiya hişmend vedigere ku di van 28 salan de hatiye peyrewkirin.

PDK: Em tekeziyê di cîhbicîhkirina rîkeftinan dikan û Hikûmeta Federal dive di dema xwe de mûçe û budceya Herêma Kurdistanê bişîne

Bi serperiştiya Serok Barzanî, Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistanê civîneke berfireh kir û ragehandina wê civînê jî parve kir.

Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) iro 29.08.2024, bi serperiştiya Serok Barzanî civîneke berfireh kir û li ser hilbijartinan tekez li ser birêveçûna piroseyeke pakij û zelal kir, herwahadaxwaz ji xelkê Kurdistanê kir ji bo pîrkirina valahiya desthilatêa danana qanûnê çavdêrîkirinê û hilbijartina perlemaneke çalak ku li astê çavdêrî û heza xelkê Kurdistanê be, tevî hilbijartinan bibin.

Herwaha Komîteya Navendî ya PDKê tekez dike ku PDK gelek bi şiarî û hûrbînî pêngavan ji bo parastina berjewendiyênil bilind û qewareya Herêma Kurdistanê diavêje û di ragehandina wê de hatiye, "Di vî warî de tevaya peywendiyan navxweyî û herêmî û navdewletî di xizmeta verevandina metirsîyan e û bizav e ji bo dabînkirina ewlehiyê û dûrxistina encamên xirab ên wan aloziyan li Herêma Kurdistanê ne."

Wê ragehandinê di derheqa pirsigirêkîn navbera Hewlîr û Bexdayê de amaje daye, "Ev civîn tekezê li

ser bicihanîna destûr û lihevkirinan dike û piştevaniya Hikûmeta Feder-

yekhelwest û teba bin, derfet neyên çêkirin ku nehez û li dijî mafîn me




alî dike ji bo bixemwergirtina vê mijarê û ci dî ev mijar neyê paşxistin, wekî ku bîryar li ser hatiye dan û budceya Herêma Kurdistanê di dema xwe de bê şandin."

Komîteya Navendî ya PDKê herwahali ser rewşa navxwe ya Herêma Kurdistanê ragehand, "Ji ber ku hilbijartina li pêşya Herêma Kurdistanê ne, ji hemî deman pêdivitir e li ser bingeha parastina berjewendiyênil bilind û destkeftî û mafîn gelê me û parastina dezgehêñ destûrî û qewareya Herêma Kurdistanê

feydeyî werbigirin û zirar bigehe Herêma Kurdistanê. Nabe ku cudahîyên me li ser hisaba qewareya Herêma Kurdistanê û desthilatên wê yên destûrî û maf û jiyara xelkê Herêma Kurdistanê be, gel û niştîman ji cudahîyên me li pêştir û pîrozti in." Herwaha wê civînê piştevaniya xwe ji bo Serokatiya Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê tekez kir û piştevaniyê ji bo pêngavêñ wan ji bo çarekirina pirsigirêkan, herwaha ji bo hilbijartinê gera şeşê ya Perlemana Kurdistanê.

Mesrûr Barzanî pêşwazî li Berpirsê Ofîsa Pêwendiyêن Yekîtiya Ewropayê li Herêma Kurdistanê kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ûro 24ê Tebaxê pêşwazî li Berpirsê Ofîsa



Pêwendiyê Yekîtiya Ewropayê li Herêma Kurdistanê Torkild Byg kir, ku bi boneya bidawîhatina erkê xwe serdana Herêma Kurdistanê kiribû. Li gorî daxuyaniya Hikûmeta Herêma Kudistanê, Serokwezîr Mesrûr Barzanî spasiya alîkarî û piştevaniya Yekîtiya Ewropayê ji bo Herêma Kurdistanê kir û pêzanînên xwe jî ji bo rola Berpirsê Ofîsa Yekîtiya Ewropayê di pêşxistina peywendiyê dualî de nîşan da.

Berpirsê Ofîsa Pêwendiyê Yekîtiya Ewropayê tekezî li ser berdewamiya kar û çalakîyen wan û berdewamiya hevkarî û hevahengiya ligel Hikûmeta Herêma Kurdistanê kir.

Di civînê de, behsa amadekariyên hilbijartînên Parlamentoja Kurdistanê jî hat kîn, di vê derbarê de amaje bi giringiya besdariya çavdîrên navdewlefi û Yekîtiya Ewropayê bi taybetî hate kîn, ji bo birêvebirina proseyâ hilbijartinan bi awayekî dadmend û dûrî binpêkirin û sextekariyê.

Navê keça xwe kir Ala Rengîn: 'Ma Xwedê nikarê bi navê Kurdî gazî bike?'

Şenîyê navçeya Silopiyayê ya parêzgeha Şîrnexa Bakurê Kurdistanê navê keça xwe kir Ala Rengîn.



Gelek kesan, gelek nav pêşnîyar kîn. Navê erebî! Çima em navê erebî li zarokên xwe bikin? Ereb, Tirk û eceman kengê navê kurdî li zarokên xwe kîn? Mezinîn me bi hesasîyet ên olî navê me hemû kîn erebî, sedemîn wan bila "Navê Axretî" be. Ma Xweda nikare bi navê Botan, Cegerxwîn, Elîşêr vs bi navê kurdî gazî be bike? Axret ango Axir. Yanî pişt re, dû re. Hê dema niha em lê dijîn me azad nekîrî û me ne jîyaye em ketine pey axirê! Demê niha pişt re Axir! Jibo wê min navê erebî hemû avêtin û navê keça xwe kir Ala Rengîn. Wekî Cenabê Serok Barzanî keremkir û gotî; ez di bin Alaya Kurdistanê hatim ser dinê û eze di bin Alaya Kurdistanê jî bimîrim. Keça min jî wekî wêneyî di bin Alaya Rengîn hat ser dinê û navê jî Ala Rengîn ê û dê xizmeta Ala xwe, welatê xwe û neteweya xwe bike. Yek ji birêvebirîn HezKurdê Fethullah Elçî ji Rûdawê re ragihand ku wî hemû navê Tirkî, Farsî û Erebî red kîn û navekî kurdî li keça xwe kir. Fethullah Elçî da zanîn ku wî ji gotina Serok Mesûr Barzanî ya "Ez di bin Alaya Kurdistanê de hatim ser dinyayê û ez dê di bin Alaya Kurdistanê de jî bimîrim" feyz wergirtiye û navê keça xwe kîn Ala Rengîn. "Ma Xwedê nikare bi navê wekî Botan, Cegerxwîn û Elîşêr gazî bike?" Çalakvanê Kurd Fethullah Elçî got: "Gelek kesan, gelek nav pêşnîyar kîn. Navê Erebî! Çima em navê Erebî li zarokên xwe bikin? Ereb, Tirk û Eceman kengî navê kurdî li zarokên xwe kîn?

Mezinîn me bi hesasîyetê olî navê Erebî li me hemû kîn û sedem jî ku bila navê axireti bin. Ma Xwedê nikare bi navê wekî Botan, Cegerxwîn û Elîşêr ên bi kurdî gazî bike?

Keça min jî wekî wêneyî, di bin Alaya Rengîn de hat ser dinyayê û navê wê jî Ala Rengîn e. Ew dê xizmeta alaya xwe, welatê xwe û neteweya xwe bike."

Hejmarek nivîskar û rewşenbîr li dijî tundî û terora PKKê daxuyaniyek dan

Bi dehan rewşenbîr, nivîskar û medyakarêne Kurd daxuyaniyek bi zimanê Kurdî, Erebî û Îngîlîzî ji raya giştî û Kurdistanê re belav kîn û tê de ragihandin, "Em pêwîst dibînin ku li dijî tundî û terora dewleta Tirkîye ya ku Kurd û Kurdistanê dike armanc, dengê xwe bilind bikin."

Herwiha di daxuyaniyê de hat gotin: "Em li dijî hismendî û kîriyaren PKK yên xiyanet kîn û sitemkarîyê ne, ku civaka Kurd armanc digre, û em diqîrin û ji PKK re dêjin: «Edî bes e». Ev hismendî û kîriyaren PKK ku civak, malbat û kesayetîya Kurd dide ber xwe û xera dike, em şermezâr dîkin."

Daxuyaniya rewşenbîr û nivîskarêne Kurd wiha ye:

"Daxuyanîyek ji bo raya giştî û Kurdistanê re

Di gelek serdem û qonaxê dîrokê de, çêbûye ku rewşenbîr, wêjevan û hunermend li ser hînek mijar û nerînan, ne gîhîştine hev û ne bûne yek, û di nav pêl û alîyên ramyari û idyolojîk yên cûr be cûr de belav bûne. Dibe ku ev alîyên han; nakok û dûrî hev bin jî, lê qata rewşenbîrî, ronakbîrî û nivîskarî, tiştî wan dîghîne hev û aramanca wan ya sereke û daxwaza wan ya herî hevbes, bilind û bi nirx azadî ye, û dê wîsa bîmîne. Ew azadîya civakî û yan takekesî ku nebe metod û alav û bingeh da kesê din ji holê ranake, û mafê wî yê rexnegêrî binpê neke û ne çewsîne. Ew azadîya ku oksojîna jîyanê ye û nivîsk û misogerîya rûmet û dadwerîyê ye.

Gelê Kurd, wekî hemû gelên bindest, pêwîstîya wî bi rizgarî û azadîye pir heye, ci di hindirê welat de, ci li deriveyî welat (Diaspora) be, ji ber ku Kurd ji berê ve û ta nuha jî, zilm û zorê dibînin û êş, jan û azarêne wê dikşînin, ne azadîya li ser asta giştî ne ya li ser asta takeksî heye. Her wiha eger Kurd di rewşa zilm û zorê û sitembarîyê de bîmînin, baş tê zanîn bê kî sûde ji vê rewşê werdigre. Lewra ji her demê zêdetir pêwîstî bi helwestekî rewşenbîrî û ronakbîrî yekbûyî, xurt û wêrek heye, û gelekî girîng ku xwe dide pêş û li himberî faşîzim û tarîperestîya olî û ya idyolojî derdikeye, ku ev faşîzim jîyan, rûmet, azadî û gepa nanê mirovê Kurd aramac digire.

Em hemû rewşenbîr, wêjevan û nivîskarêne ku nav û îmzeyêne me li binê vê daxwîyanîyê de hene, di xebata Kurdevarîyê de em xwedî nerîn, peyv, helwest û ked in, em dibînin ku ji erk, delamet û peyw-

era me ye em dengê xwe biling bikin û li dijî teror û tundîya dewleta Turk ku Kurd û Kurdistanê daye

û di dadgehîn welatê Europa de hatine tekez kîn.

Ji vê grûpa çekdar re û hemû



ber xwe, û her wîsa em li dijî hismendî û kîriyaren PKK yên xiyanet kîn û sitemkarîyê ne, ku civaka Kurd armanc digre, û em diqîrin û ji PKK re dêjin: «Edî bes e». Ev hismendî û kîriyaren PKK ku civak, malbat û kesayetîya Kurd dide ber xwe û xera dike, em şermezâr dîkin.

